SİMM SİMMM SİMAÎL



Arjen Arî

'Ji ber ku vê civakê gotiye, "şûna xencerê rehet dibe, ya peyvê dimîne", Xweda şahide; tu wext û dewranan min nexwestiye 'şûrê peyvê' ji bilî dujmin- li siya tu sawêrî hildim. Li derûdorê bi qasî ku mîna mirovekî "zimandirêj" tême bi navkirin jî- mafdar in; ji ber ku ez jî neviyekî Cegerxwîn im- heta ji min hatibe, berî gotinê, min peyv bi "gaza mêjî" "pîvaye" û bi "şehîna" dil "teqillandiye".Ji vê yekê,dibêjim:
Peyv hene; mîna "şiqamekê ''*li dev û rûyê mirov dikevin.*
Peyv hene; cemed in, mîna qeşay*ê sar.*
Dilşaker in hin*in; dil* "miftî belaş" dikirin.
Hin dil-xelên in, aqil ji ser dibirrin
Pirpirînek in hin; dilê kulîlkê seh dikin.
Hin bi devê xwedî bi per û bask dibin
Eylo ne hinek bilind bilind difirin
Hinek ker î kerikî weke ku bizirin
Kelê ne hin, mislê savara rijî!
Hin naçin xwarê tu rûn lê birêjî
Çavan dineqînin, hin vexwedîner in.
Hin miruskirî, reş reş,dîq *dinerin*
*S*iviktirr ji qirş, *hin* qirûşek *nakin.*
Hin zêrê zer bi yaqut beramber in
Tu çi bibêjî bêj; kin lê de ne dirêjkî
*Bibêj û bipê*j, bes şuş*ê* dil meşkî…!
Peyv jî weke tepizkê ye. Bi hemd, bê hemd carinan ji devê mirov dipeke.
Bi pekînê re tiştek dişike: şûşê dil!
Û gotine:'' ku dil şikest, nacebire''.

***

Ji vê rastiyê; pirrê caran meriv berî gotinê ji yê li pêşberî xwe re vê dibêje: dilê xwe megire; lê belê…
Ev "lê belê" dikeve şûna mertalê xweparastinê; xwediyê peyvê li yê li hember degeltir dike.
Jixwe weke gellek tiştên din; di çanda kurdan de derbarê

axaftin/gotin/rabûnûrûnişti̇n û peyvê de 'zagonin nenivîskî'' hene, û ev ''zagon''dikin ku kesên ji vê civakê di cem'etakê de di nava wan sînorên ku berî û bêyî wan hatine kêşan de, tevbigerin.
Li hêla din berî min gotine:''Sim sim Simaîl''
Yanî kurt lêde.Yanî; tu çi bibêjî bibêj, kin û kurtê vê ''ha kevir li serî ha serî li kevir''e.

Ez ê ''kevirê xwe di ber xwe re bernedim'' û ez ê bidomînim:
Di civakeke ku ji ''qal û belayê ''de daye dû rizgariyê,û hê nû nû bi ser rêç û şivîleyine azadî û xwenasiyê vedibe de; şaîr ku ne qurre be, peyveke vî nîn be bo gotinê… şa'ir e?
Min ji dostekî xwe bihîst; li Îranê keçeke ku nikaribe çend rist û bendan ji Hafiz jiber bixwîne tê wê maneyê ku ew kiç hê 'kamil'' nebûye.
Şa'irtiya Hafiz li hêlekê, bi min şa'ir ew e; peyva xwe di gel dujminê xwe, li gel dostên xwe texsîr neke; ku karibe ji dujminê xwe re bibêje''rahije teşkên xwe, derkeve ji welatê min'' li hêla din li dostên xwe vegere, bibêje:

*Cotek pêlavê*n reş li min in
Bi pîne,sivik,erzan…gemarî û heram
Hezar car ev pî û ev pî bi hev guherîne
Çi cara ez li wan dinerim
Ne bi destê min e
*Serê pêlavê pozê hin serokên kurd tîne bîra min!**

Peyveke pêşiyan e, wan gotiye wan hiştiye:Kuçik hestî dixwe, hesabê qûna xwe dike.
Ya min jî tiştekî wisa ye.
Di bernameyeke heyva borî de ku Komelaya Çira li Amedê amede kiribû,min ev got:
Ez bi girr û înad li ser vê xakê mam. Derfetên ku sed carî karibim herim û venegerim ketin destên min. Min weke jîngeh her ev ax hilbijart. Lê; ne mecbûr im ku li vir, li ser vê axê, di nav we de bimrim. Bindestiya min qetek ji bindestiya we ye. Ez bi xwe azad im; azadekî li gel we hêsîr! Û hûn qet ne mecbûr in ji min hez bikin, ji ber ku ez ji we û vê axê hez dikim.
Ez ji bo xwe û ji xwe ji vê axê hez dikim. Ne ji axê bi tenê: ji kulîlkên li ser vê xakê, ji hewaya wê, ji roj û şewa wê… xasma ji çiyayên wê; ji dar û deviyan, ji zeviyên rû-nîsan, ji gundên mil-perîşan…

***
Weke her bûnewerî ez jî bi hezê pir dibim.
Ji min hez neke jî ez ji yarê hez dikim.
Hez dareke bilinde li gorî min, pirşax û pirgulî.

Ku ji vê axê hez kiribim/bikim ji mafê mine dil bidim; li ser xakê bi heza wê re,bi ya dara berûyê re, bi hezkirina gundekî re heza xwe/hêza xwe mezintir bikim…
Lê; ji kerema xwe, bo ku ji vî welatî hez dikim, ji min hez nekin!
Bo çi?!
Bo ku hez nayê bazarê.
Bo çi?
Bo ku bi hez dil-sa ye, direye re.
Bo çi?
Bo ku hez bi bazarê dilewite.
Bo çi?
Bo ku Ehmedê Xanî; Seydayê Seydayê min Cegerxwîn gotiye:
…….
Şûrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn
Kafir bûyîn em bi ismê Qehhar
Xeffar e ku em kirin gunehkar
û domandiye:
…….
Hisna nebitin çu hed- û xayet

Na bit ji xwe aşiqan nîhayet
Lê aşiq û bulhewes cuda ne
*Hin faîdexwaz û hin fîda ne.***
Di ser van ristan de 312 sal bihurîn.Wî qewmî, vî qewmê hêsîr û bêbîr ferq nekir ka kî xwediyê '''şûrê huner'' e, ka qedrê ''qelemê'' kê bizane; ''hed- û xayeta'' kê çi ye, kî ''aşiq'' e, kî ''bulhewes''e; ''faîdexaz''kî ye, kî ''fîda''ye…
***
Ez bejna xwe jî, qama helbesta xwe jî peyv bi peyv, rist bi rist li ber giyanê''fîda''yan diçimînim, ditewînim…
Lê li hember ''bulhewes'' û ''faîdexwazan''?
Min belengazî çarînek heye, ku mebesta min bi vê çarînê ne ew e ku li vir ''teriya''helbesta xwe bi ya Xanî re, bi ya Cegerxwîn re biqusînim e:

min ziman kir kefaret di ber şîr de
min xwîn kir kefaret di ber şûr *de*
serê'm neçimiya, enî nizm nebû
*ne ji Zahir re, ne jî ji tûr re****

Tûr neman, cuher jî…
Mabin jî- ku mane- serê xwe têxî ''cuherê'' kê, dibî ''kerê'' wî!
Êê.. şa'ir û keritî?
***
Ma ne,me sernavê nivîsa xwe kiribû''Simm Simmm Simaîl''?

*Birakujî,Abdula Peşêw,Wş.Avesta,rp 13
**Mem û Zîn,Ehmedê Xanî,Wş Hasat,rp 50- 92
***A.Arî